Bidestveanîna mafên neteweî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî





**DI VÊ HEJMARÊ DE:**

Peyama Sikirtêrê Giştî yê PDKI bi hilkefta 81 saliya avakirina Hizbê . 2
Rojev ........................................ 7
Hevpeyvîn ................................ 8
Civakî ......................................10
Mafê Mirov ............................... 11
Poster........................................ 12

1 Hejmar (524)
2026-08-22

www.agirimedia.org

# Mistafa Hijrî: Damezrandina Hizba Dêmokrat, werçerxaneke girîng e di tevgera neteweyî ya Kurdistanê de



**Birêz Kak Mistafa Hijrî, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 25ê Gelawêjê, 81emîn salvegera damezrandina Hizba Dêmokrat, peyamek kir.**

## Deqa peyamê bi vî awayî ye:

Bi hilkefta 81 saliya damezrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û bîranîna mezin a 25î Gelawêjê, ez pîrozbahiyê li kurdistaniyên hêja dikim.

Damezrandina Hizba Dêmokrat, werçerxineke girîng e di tevgera neteweyî ya Kurdistanê de; Hizbek ku civaka kurdewarî ji bo gihiştina mafên xwe yên neteweyî rêxistin kiriye û zêdetirî 80 salan e nûnertiya fikra kurdistanî û neteweyî ya Rojhilatê nîştiman dike.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, bi peyrewkirina prensîbên xwe yên fikrî yên neguhêr wekî serbixweyiya siyasî, rastbînî, rastgoyî, piştgirêdan bi gel û girêdana çarenûsa tevgerê bi hêz û enerjiya hundirîn a Rojhilat ve, kariye di rêbaza xwe ya neteweyî û dêmokratîk de berdewam û xweragirtî be. Her van taybetmendiyan jî, tevî hemû astengî û evraz û nişîvan di rêya xebatê de, wisa kiriye ku dîrokeke tije serbilindî ya 81 salî ji bo neteweya me tomar bike.

Di vê bîranîna pîroz de, ligel pîrozbahîkirina vê roja mezin, em serê rêzê ditevînin ji bo rihê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê û malbatên wan yên serbilind, bi taybetî rêberên me yên şehîd Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkindî û hemû şehîdên rêya rizgarî û serbestiyê.

**Slav li îradeya netewî a girtiyên siyasî yên xweragir.**
**Slavên emegdarî ji bo hemû wan têkoşerên ku di nava refên Hizba Dêmokrat de temenê xwe ji bo xebatê terxan kirine.**

**Mistafa Hijrî**
**Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**24î Gelawêja 1405an a Rojî**

### 25ê Gelawêjê, berdewamiya projeyeke siyasî li dîroka Kurdistanê de




Nemana Komara Kurdistanê bi wateya dawîhatina vê pêvajoyê nebû. Hekîçi givaş, sêdaredan û nehêlana fîzîkî ya rêberên siyasî, pêkhateya siyasî ya vê ji nav bir, belku nekarî bingeha civakî û siyasî ya pirsa Kurdistanê ji holê rake.

RUPELA 4

### Serwerî û rêkxistina neteweyî Ji îradeya Siyasî ber bi îradeya neteweyî: Stratejîya avakirina Serwerîya Neteweyî




Têkoşîna neteweyî ne tenê pirsgirêka parastina nasname, ziman û çandê ye, di heman demê de pirsgirêka rêxistina ji bo îradeya neteweyî û ya pêkhateyên Kurdistanê ye . Neteweyek dikare xwedî dîrok, bîranîn, ziman û hişmendiya hevpar be, lê heger ....

RUPELA 5

### Ji reşkirina nasnamê ve bo serbixweyî ya hizrî, Ciwanên Kurdistanê û avakirina jêrxana civakê



Dema em behsa rol û şiyana ciwanan bo guhertin û pêşxistina civakê dikin, nabe rewşa taybet a civaka Kurdistanê û ew rastiya dîrokiya dijwar bê jibîrkirin ku ciwanên me tê de perwerde bûne.

RUPELA 6

# Peyama Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 81 saliya avakirina Hizbê

**Ev deqa peyamek siyasî û stratejîk e ku ji aliyê Sekretêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve ku ji bo beşdarên korîyada 81 saliya damazrandina Hizbê li Waşîngtonê hatine şandin. Gotar proje û dîtina Hizbê ji bo paşeroja siyasî ya Îranê, awayê derbasbûna ji deshilata niha, û bingehên çareserkirina pirsyarên neteweyan dixîne ber çavan.**




**Rêzdaran!**
**Beşdarên merasima yada 81 saliya damazrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li Waşîngtonê!**

Bi vê boneyê ez pîrozbahiyê li hemû rêberayetî, kadr, pêşmerge, endam û alîgirên Hizba Dêmokrat dikim.
Hevdem serê rêzê ditewînim ji bo hemû wan hezaran têkoşerên ku rêvîngên vê rêka dûr û dirêj û tijî asteng û dijwarî bûn gelekan cane xwe gorî kirin, yan li ser vê rêyê hatine girtin, darvekirin, û ji welatê xwe hatine derbederkirin, da ku ev Hizb her li ser pêyên xwe û bi hêz bimîne.

Spas û rêz ji bo we beşdarên vê korîyadê li Waşîngtona paytexta Welatên Yekbûyî yên Amerîkayê.
Ez serbilind im ku wek Sikirtêrê Giştî yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê civînê re derfet heye ku bi kurtî armanc û siyasetên vê Hizbê bixim ber bas, ji bo agahdarkirina we rêzdaran û nasîna zêdetir a Hizba me.

Li çarçoveya hevkêşeyên herêmî û wan guhertinên ku tên çavnihêrîkirin, careke din awayê çêkirina qewareya siyasî ya Îranê û paşeroja “pirsa neteweyî” ya gelên li vê erdnîgariyê dijîn, di rojevê de ye. Ji bo pêşkêşkirina alternatîfek dêmokratîk ji bo rejîma niha di nav wan senaryoyan de ku ji bo paşeroja Îranê hatine pêşkêşkirin, federalîzma neteweyî-cografiyayî modela siyasî ya herî guncaw e. Li vê modelê de geşedan û giraniya tevgera Kurdistanê û herêmên neteweyî yên Îranê rolek biryardar dilîzin.

Ji ber vê yekê, hilbijartina her stratejiyekê ji bo guhertina siyasî li Îranê, divê hem li ser bingehê hevsengiya herêmên neteweyî be û hem jî li gorî rêkeftin û dêmokrasiyeke lihevhatî be. Bi vî awayî, armanca dawî ya her pêvajoyek siyasî di paşerojê de, divê çareserkirina pirsa giring a neteweyî be, bi awayekî ku deshilata siyasî û serweriya yekalî ji navendê helweşe û beşdarî û serweriya hevpar a hemû neteweyan garantî bibe.

Ezmûna naskirina Îranê wek erdnîgariyeke pirnetewe, mijarek nîne ku ji paşerojê re bê hiştin, yan bi hincetên cûrbecûr bê paşxistin, belkî beriya her îhtîmal, rêkeftin û derbasbûnê, divê wek modêla herî baş a siyasî, jiyana hevpar bibe bingeh û ji bo dîzaînkirina sîstema siyasî ya paşerojê sûd jê bê wergirtin.
Di dîroka xebata rizgarîxwaziya neteweya kurd de, tevgera neteweyî-dêmokratîk a Kurdistana Îranê bi giştî û bi taybetî, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, paşxaneyeke dûr û dirêj ji xebat û têkoşînê heye. Xebat ji bo bidestxistina mafê diyarkirina qederê û parastina nasname û axê û dabînkirina mafên rewa yên neteweya me, prensîbên neguhêr yên vê tevgerê bûn.

Tevgera Kurdistanê di dîroka hevçerxde, bi sedema ewlekarîkirina nasnameya kurdî û ezmûna sûdwergirtina ji rêyên berxwedan û xebata rewa, xwedan rêxistineke xurt û hêzeke fireh a meydanî ye û bandora xwe di hevkêşeyan de îsbat kiriye. Ev tevger, tevî şert û mercên dijwar û astengên li beramberî xwe, ti carî faktoreke demkî yan li qiraxê nebûye, belkî berdewam di xebateke bênavber de bûye.
Tevgera neteweyî ya Kurdistana Îranê, xwediyê projeyeke siyasî ya zelal û modern e ji bo paşeroja Îran û Kurdistanê, ku li ser bingehê mafê diyarkirina qederê û dêmokrasya beşdarbûyî hatine çêkirin. Her nêrîneke navendger, ku hewla piştguhxistina wê bide, ne tenê nikare çareseriya qeyranan bike, belkî mercên paşerojeke aram jî ji holê radike.

Kurdistan, bi hebûna hêzeke piralî û berfireh a meydanî û bi hişyariya neteweyî ve, xwediyê amilîyet, hêz û sermayeya xwe ya civakî ye û beşek e ji çareseriya bingehîn a şer û alozî li Rojhilata Navîn de. Ti pêvajoyeke guhertinê li Îranê nikare serkeftina rastîn bi dest bîne, eger mafê neteweya kurd ji bo serwerî û îradeya siyasî ya Kurdistanê ber çavan negre.
Pirçeşniya neteweyî û pirkêşiya li Îranê de, bi berevajiyê siyaset û nêrîna navendgerî û şovînîstî, ne tenê gef nebûye, belkî derfet û bingeha sereke ye ji bo avakirina paşerojeke aram û dêmokratîk. Qebûlkirina vê pirçeşniyê û dabînkirina mafên neteweyî bi awayekî wekhev, hemû pêvajoyeke siyasî li Îranê ve girê dide bi jiyana hevpar a aştiyane û dilxwazane.

**Fêderalîzm: Wek Çarçoveyeke Dêmokratîk**
Fêderalîzma rastîn ti carî bi wateya helweşandin yan dabeşbûna welat nayê, belkî mekanîzmayeke pêşketî ya siyasî û birêvebirinê ye ji bo civandina pêkhateyên cûda di nav çarçoveyeke dêmokratîk û hevpar de.
Ev sîstem, deshilatê ji navendekê ve dıguhezîne ji bo rêveberiyeke hevpar ku tê de wekheviya neteweyan, parastina nasnameyên cûda û dabeşkirina dadperwerane ya erk û mafan, ku dibe bingehê aramiya û jiyana hevpar a dilxwazane.

Hevkarî û razîbûna hemû neteweyan, wek peymaneke civakî, rewayiyê dide sîstema rêveberiyê û baweriya di navbera aliyan de xurttir dike. Li beramber de xwesepandin û qorixkirin, dewletê dike sîstemeke tijî kirîz û nearam, ku berdewam li ber dergehê hilweşîn û pevçûna navxweyî de ye.

Kirîzên kûr yên Îranê ti carî bi rêya desteserkirin û monopolkirina biryara siyasî çareser nabin. Derbasbûna ji vê rewşê hewcedarî bi guhertineke bingehîn heye ku bi wê sedemê paşeroja Îranê bi rêya diyaloga kûr, danûstandin û rêkeftina pirneteweyî bê diyarkirin.

Tekezîkirin li ser ewlehiya nasnameya neteweyî, mercê sereke ye ji bo hebûn û mana neteweyên blindest, çimku pêdagirî li ser pirsa nasnameya neteweyan, astengeke sereke ye li beramber siyasetên helandin û piştguhxistina wan. Li heman demê de ewlehiya nasnamê ji bo van neteweyan, bi wateya parastina hebûna fizîkî, kultûrî, zimanî û siyasî ye, li beramber her cûre gefekê. Ev rastiya dîrokî û siyasî, bi zelalî nîşan dide ku ti sîstem nikare navê dêmokrasiyê li xwe bike gava ku mafên mirovî û neteweyî yên erdnîgariyeke pirnetewe zewt bike. Li aliyekî din ve jî bêyî hebûna dêmokrasiyeke rastîn, zilm û zora li ser neteweyan û rehendên din yên zilmê, berdewam dibin, ji ber vê yekê dêmokrasî û mafê neteweyî du prensîbên bi hev ve girêdayî ne.

**Hewcedariyên Derbasbûnekî Serkevtî**
Derbasbûneke siyasî ya serkevtî bi armanca derbasbûna ji rewşa zilmê û dawîanîna bi ezmûna têkçûyî ya navendgeriyê, divê li gorî beşdarbûna aktîf a neteweyan û razîbûna pêkhateyên cûda bê avakirin:
**1 -** Êtirafkirin bi herêmên neteweyî wek aliyê sereke yê beşdarbûna siyasî di çêkirina nexşerêya derbasbûnê de.
**2 -** Çespandina yasayeke giştgir ku tê de hemû netewe û pêkhate piştrast bin ku mafên wan yên siyasî tê de parastî ne.
**3 -** Bi karxistina mekanîzmaya federalîzma rastîn, ji bo dawîanîna bi monopolbûna navendê û siyaseta dagîrkeriyê, bi mebesta dabeşkirina dadperwerane ya deshilat û çavkaniyan.
**4 -** Xweşkirina rê û zemîneyekê ji bo diyalogeke hevseng di navbera hemû aliyên siyasî û civaka medenî de ku divê hemû beşên civakê li xwe bigire.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tekeziyê li ser wê rastiyê dike ku federalîzma rastîn û hevkarîya dilxwazane kite rê ye ji bo avakirina Îraneke dêmokratîk, çimku dîrok û hevkêşeyên siyasî îsbat kirine ku bêyî dabînbûna mafê neteweyî, dêmokrasî ti carî sernakeve û bêyî dêmokrasiyeke kûr, netewe ji bindestiyê rizgar nabin. Ji ber vê yekê Îrana paşerojê divê li ser bingehê serweriya siyasî ya hevpar û wekheviya hemû neteweyan bê avakirin. Berevajiyê vê yekê, dubarekirina derbasbûyî, ti aramiyê ji bo paşerojê peyda nake. Em tekeziyê jî dikin ku bêyî pênasekirina nû ya çemka “netewe” li Îranê, peywendiya dagirkariyê ji bo hemîşeyî dimîne. Ev pêwîstî mercên bingehîn in ji bo ku pêvajoya derbasbûnê bibe destpêkek ji bo dêmokrasiyeke demdirêj û encamdar.

Di dawiyê de, wek Hizba Dêmokrat, bi xwendina derfet û gefên li ser rêya tevgera neteweyî ya Kurdistanê, berpirsiyariya xwe ya dîrokî ber çavan digirin û em mukum in li ser pêkgihîştina neteweyî û hev-xebatî digel neteweyên din û pêvajoyên dêmokrat û azadîxwaz, ji bo sernixûnkirina rejîma Komara Îslamî ya Îranê û avakirina Îranekê ku cûdahî hebe ji berê.

# Peyama Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê li derheq salvegera fitwaya Xumeynî bi dijî gelê Kurd



**Fetwaya cîhadê ya Xumênî di 28ê Gelawêjê de fermana dagirkirina Kurdistanê bû**

28ê Gelawêja 1358an (19ê Tebaxa 1979an) xala guherîna peywendiya kurdan li gel Komara Îslamî û roja derxistina fetwaya cîhadê ya dijî neteweya kurd bû, fetwayek ji bo tolstandina sîstematîk ji neteweyekê ku bi hişyarî û yekdengî «Na» ji rêferanduma Komara Îslamî re got. Ew fetwa ne biryareke nişkêve, belkî di rastiyê de pevçûna du paradaymên fikrî û siyasiyan bû. Ji aliyekî ve nêrîna dagirkerî û totalîtarîzmê bû ku hewla ji nû ve çêkirina pêkhateya desthilatdariyê dida, ji aliyê din ve jî tevgera rizgarîxwaziya kurd bû ku rengvedana îradeya rastîn a gel bû ji bo gihîştina mafên xwe yên bingehîn û gelên din ên li Îranê.

Fetwaya 28ê Gelawêjê, fermaneke nû bû ji bo siyaseteke naskirî ku çavkaniya wê ji wê nêrînê dihat ku berê jî di serdema desthilata padîşahiyê de ji aliyê desthilata navendî ve dijî neteweya kurd hatibû bikaranîn. Di Gelawêja 1358an de, desthilata nû bi berdewamîdana siyaseta înkar û helandinê û bi êrişkirina ji erd û asman ve, siyaseta dagirkeriyê ji bo ser Kurdistanê dubare kir. Leşkerkêşiya Komara Îslamî bi biryara Xumênî di demekê de bû ku neteweya me li Rojhilatê Kurdistanê, maf û daxwazên xwe yên rewa li ser bingehê beşdariya siyasiya dadperwerane û çareseriya aştiyane ya pirsên kurd, bi şêwazekî dêmokratîk û bi rêya diyalog û danûstandinê birêve dibir. Belê desthilatdarên Îranê nekarîn niyeta xwe ya dijminatiya li beramberî kurdan veşêrin.

Di 28ê Gelawêja 1358an de Xumênî di peyamek tund de fetwaya cîhadê dijî xelkê Kurdistanê ragihand. Ji aliyê siyasiyî û olî ve, bikaranîna çemka cîhadê li beramberî welatiyên Rojhilatê Kurdistanê, rewaitî da hêzên çekdar ku her cure tundûtûjiyê li beramberî xelkê Kurdistanê encam bidin. Hêj di roja yekem a ragihandina fetwaya cîhadê de, hêzên çekdar ên Îranê û bi taybetî hêzên Spaha Pasdaran bi çekên giran û piştevaniya hêza asmanî ber bi bajarên Rojhilatê Kurdistanê ve hatin veguhastin.

Di destpêka êrişan de bajêrê Pawe û navçeyên Hewramanê ketine ber êrîşa hêzên Spaha Pasdaran û hatin dagirkirin. Rasterast li gel dagirkirina bajêrê Pawe, Sadiq Xelxalî wekî hakimê şer' gihîşt navçeyê û di dadgeheke sehrayî de bi dehan kes ji welatiyan gullêbaran kirin ku birîndar, mamoste û bijîşk jî di nav wan de bûn. Piştî dagirkirina bajêrê Pawe, êrişan berê xwe da bajarên din ên Kurdistanê bi taybetî Sine, Merîwan, Seqiz û Mehabadê. Piştî kontrolkirina bajaran, êrîşa Spaha Pasdaran gundan jî vegirt û bi komkujiya welatiyên gundê Qarnê û Qelatanê, zincîre êrişên li pey hev ji bo ser gundên Kurdistanê hatin birêvebirin.

Li beramberî wê êrîşa leşkerî û herwisa fermanên piştre ku bi hezaran welatî û têkoşerên kurd hatin gullêbaran kirin, xelkê Rojhilatê Kurdistanê nekefte qedeman û teslîm nebû. Berxwedana kurdan nîşan da ku îradeya neteweyekê ji bo man û azadiyê, ji her ferman û êrişekê bihêztir e. Di vê rojê de xwîna bi neheq rijiyayî a wan ciwan, jin û welatiyan bi bîr tînin ku bûn qurbanî û navên wan wek şehîdên rêya azadiyê di dîroka Kurdistanê de zindî ma.

Di niha de jî berdewamiya heman siyaset û fetwaya cîhadê ya Xumênî dijî neteweya kurd, di kuştina welatiyan, darvekirinan, tepeserkirina çalakan û armancgirtina sîstematîk a nasnameya kurd de bi zelalî tê dîtin. Li beramberî vê siyasetê, erkê îro û dîrokî ya neteweya me, parastina yekrêziya neteweyî, xurtkirina piştevaniya navbera hemû neteweyên dêmokratxwaz û xweragirtin e di sengera têkoşîna sivîl û siyasiyî de. Têkoşîna me jî ji bo dêmokrasî, tunekirina cudakarî û bidestxistina mafên me bi taybetî mafê diyarkirina qederê, bi gavên qahîmtir ji berê heta bidawîanîna vê eqiliyet û desthilata desthilatparêz berdewam dibe.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**

**27ê Gelawêja 2726an**

# Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê, êrîşên Îranê yên dijî saziyên Herêma Kurdistanê şermezar kirin




Bi êrîşa dronî ya Komara Îslamî ya Îranê bo ser nivîsgeha taybet a birêz Mesrûr Barzanî Serokwezîrê Herêma Kurdistanê û baregeha Ajansa Parastin û Zaniyarî ya Herêma Kurdistanê, dijayetî û binpêkirina pênasiyên cîrantiyê û dest neparastina rêjîma Komara Îslamî ji reftara dijminane dijî Herêma Kurdistanê, gihîşt astekî din. Beriya wê jî komek saziyên leşkerî û hewalgirî yên hikûmeta herêmê li bajêrê Silêmaniyê, serberedayîyane û bêhêcet dan ber êrîşa tund a mûşekî û dronî ya Îranê.

Herêma Kurdistanê li heyamê şerê Amerîka-Îsrayîl û Îranê zêdetir ji 1000 êrîşên bi vî rengî li ser hatine kirin ku nîveya wan êrîşan bo ser binke û baregehên hizbên Rojhilatê Kurdistanê û cihê akincîbûna malbat û xêzanên wan bûye.

Êrîşa Komara Îslamî ya Îranê bo ser Herêma Kurdistanê li demekê dê ye ku Herêma Kurdistanê her ji destpêka vî şerî de helwesta bêalîbûna xwe ragihand û nekete eniya dijberên rêjîma Îranê ve. Ewa jî nîşana wê rastiyê ye ku dijayetiya Kurd û şerfiroşî bi serwerî û qeware û îradeyeke xwebırêveberiya kurdistanî li navçeyê de, siyaseteke bingehîn a Komara Îslamî ye.

Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê êrîşên Îranê bo ser Herêma Kurdistanê û demûdezgehên hikûmî û hizbî û medeniyên wê şermezar dike û piştîvaniya xwe ji Herêma Kurdistanê radigehîne. Herwisa derbarey wê ku ew destdirêjiyane ji rûyê yasayî ve binpêkirina eşkere ya serweriya dewleta Iraqê ye, daxwaza helwesta micid ji Bexdayê dike. Ezmûnê selmandiye ku bêdengbûn beranber reftara dijminane û têkderane ya rêjîma Îranê û reftarên wê, derfeta zêdetir dide rêjîmê bo berfirehbûna êrîşan û destdirêjiyên wê a zêdetir.

Hevpeymaniya Kurdistanî daxwaz ji welatên xwedan konsulxane û nûnerayetî li Herêma Kurdistanê dike ku bo pêşîgirtin li wan êrîşan û parastina serwerî, asayiş û seqamgiriya Herêma Kurdistanê, Rêjîma Îranê bixine bin givaşê.

**Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê**
**26ê Gelawêjê 2726**

# 25ê Gelawêjê, berdewamiya projeyeke siyasî li dîroka Kurdistanê de



N. Sîmîn Rûhanîzade




Damezirandina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê di 25ê Gelawêja 1324an de, nikare tenê di çarçoveya dîroka damezrandina rêxistineke siyasî de bê şîrovekirin. Girîngiya vê bûyerê, berî her tiştî, di veguhastina pirsa Kurdistanê ji asta rastiyeke civakî û nasnameyî bo asta projeyeke siyasî ya rêxistinkirî de ye, projeyek ku li gorî wê, civatgeha Kurdistanê divê ji rewşa mijara biryardana kesên din derbasî vê qunaxê be ku xwediyê îradeya siyasî be û xwe biriyarê li ser xwe bide.

Ev guhertin di rewşekê de hate navber ku pêkhateya hêzê li herêmê de êtiraf bi daxwazên siyasî yên Kurdan bi awayekî serbixwe û rêxistinkirî nedikir. Ji ber vê yekê, damezrandina Hizba Dêmokrat divê wekî beşek ji vê pêvajoyê ku civakek ku hewl dide di navbera nasnameya xwe ya dîrokî, rêxistina siyasî û mafê diyarkirina qedera xwe de pêywendiyeke hertimî û mayînde ava bike, bê dîtin.

Hizba Dêmokrat û Komara Kurdistanê di piroseyek siyasî de bihevre hatin girêdan û ev projeya siyasî bo cara yekem di şêweya ezmûneke hikûmdariyê de xwe da nîşandan.

Girîngiya Komara Kurdistanê nikare tenê li gorî heyama deshilatdariya wê bê nirxandin. Ew ezmûn nîşan da ku pirsa Kurdistanê, heke xwediyê rêxistina siyasî, serokayetî û îradeya hevbeş be, dikare ji qonaxa daxwazkirinê derbasî qonaxa avakirina komar û rêvebirinê bibe.

**Nemana Komara Kurdistanê bi wateya dawîhatina vê pêvajoyê nebû. Hekîçi givaş, sêdaredan û nehêlana fîzîkî ya rêberên siyasî, pêkhateya siyasî ya vê ji nav bir, belku nekarî bingeha civakî û siyasî ya pirsa Kurdistanê ji holê rake.**

Piştî vê, dîroka Hizba Dêmokrat ket qonaxekê ku tê de domandina hebûna siyasî bi xwe bû beşek ji têkoşîna parastina pirsa Kurdistanê di qada siyasî de.

Ji vê dîtingehê ve, em nikarin dîroka Hizba Dêmokratê tenê weke zincîreyek ji qonaxên dîrokî, nav û bûyerên ji hev cuda pênase bikin.

Tiştê ku vê dîrokê dike pêvajoyeke siyasî ya yekgirtî, berdewamiya ramanekê ye ku di nav guhertinên siyasî û civakî de, li gorî rewiş û şertên serdemên heyî, xwe ji nû ve pênase kiriye û gihiştiye nifşên cuda, ramaneke ku di bingeha xwe de li ser nasîn û bidesanîna mafên neteweyî yên xelkê Kurdistanê, beşdarbûna wan di diyarîkirina çarenûsa siyasî, damezrandina dêmokrasiyê û mafên Mirovan ava bûye.

Yek ji taybetmendiyên girîng yên vê pêvajoyê, şiyana wê ya ku li gorî guhertina şert û merican ji nû ve pênasekirina şêweya siyaseta xwe bike.

Mînak bo vê yekê eva ye ku Qazî Mihemed di qonaxekê de diaxivî ku saxtara siyasî ya herêmê û edebiyata yasayî û siyasî ya girêdayî bi pirsa netewî ya gelê Kurd digel îro gelek cudahiyên bingehîn hebû. herwisa Dr. Qasimlo di rewşek cuda de hewl da ku pirsa Kurdistanê bi têgehên wekî dêmokrasî, mafên neteweyî, pêkvejiyana siyasî û pêkhateya nenavendî ya hêzê li Îranê ji nû ve pênase bike. Piştî Dr. Qasimlo jî Dr. Şerefkendî û nifşên piştî wî heman pirsa di nav şert û mercên nû yên herêmê pêka rewşa ku hebû pênasekirin û berdewam kirin.

Eva vê yekê nîşan dide û berdewamiya Hizba Dêmokrat pênase dike, zimanekî siyasî yê diyarîkiriyî nine, belkî domandina arasteyeke siyasî ye, ku tevî guhartina rewş û nifşan dikare her car pêka rewşê xwe pênase bike û xwerêkbixe û berdewam be.
Ev yeka ji aliyê têorîk ve jî girîng e. Rêxistineke siyasî û dîrokî, heke tenê li ser dubarekirina dîrok û gotara berê bisekine, tinê dikare bibe parêzvanê bîranîna siyasî yên xwe, û nikare ji bo nifşên pêşerojê siyasetek zelal biafirîne. Lewma bo zindî mana hizbek siyasî ya pirojeyek siyasî divê ev bikare dîroka xwe bike bingeha karê xwe, lê di dîrokê de asê nemîne û xwe digel rewşa ku heye nû bike û siyaseta xwe pêş bixe û bibe xwediyê gotarên nû û bersivên nû.

Her bi vê dîtingehê, damezirandina Hizba Dêmokrat di 25ê Gelawêja sala 1324an yanî 81 salî berî niha, tenê xala destpêka damezrandina rêxistinekê nebû, belkû destpêka pêvajoyeke siyasî bû ku pêka wan pêverên ku me serve amaje pê kirinî, kariye heta niha di her rewşekê de bimîne û berdewam be.

Her aliyek dizane di siyasetê de, ti hêzêk heta hetayî nîne û ti hevsengiyek jî herdemî nîne.

**Dîrokê nîşan daye ku krîzên siyasî, guhertinên jêopolitîk û guhartin di pêkhateya deshelat û dewletan de dikarin di demeke kurt de hin derfetan biafirînin ku qet neyê bawer kirin, Lê derfeta dîrokî bi tenê ji bo civakekê destkeftên siyasî naafirîne û ava nake, belkû derfet tenê wê demê dibe îmkana siyasî ku hêzeke siyasî ji aliyê hizir û raman, hebûna bernameya siyasî û rêkxistinan xwe ji bo bikaranîna wê derfetê amade bike.**

Her wekî ku me amaje pê kirî, di rewşek wiha de, hebûna bernameya siyasî, kadrên siyasî, şiyana analîzkirina guhertinan, nêzkî bûn û hebûna pêywendiyê bi civakê û ...; ew yeka weke beşek ji şiyana siyasî ya vê tevgerê yan bêjin ya hizbekê tê hisabkirin û asta amadebûna vê nîşan dide.

Pêka vê yekê têgehek girîng bo pêşeroja PDKÎ têgeha asta amadebûna siyasî ye.

Amadebûn ji bo roja ku pêkhateya heyî ya deshelata hakim diguhere, ji bo rojekê ku pirsa Kurdistanê dibe yek ji mijarên navendî yên hevkêşeyên siyasî, û ji bo roja ku tenê hebûna daxwazekê êdî bes nebe û pêşkêşkirina projeyeke siyasî ya rohin dibe pêdiviyeke bingehîn.

Di wê demê de, lîstikvanê sereke ew kes nîne ku taze dest bi pênasekirina daxwazên xwe dike, lîstikvanê sereke ew e ku berî wê li ser rêkxistina civakê, avahiya hêzê û cihê Kurdistanê di îdareya siyasî ya pêşerojê de fikirîye û xwediyê bernameyekî zelal e.

Eva heman ev xalin ku berdewamiya dîrokî ya tevgereke siyasî bi şiyana wê ya berheanîna siyasete di şertên nû de tê pîvan kirin. Di 81 saleya damezrandina Hizba Demokrat de, belkî pirsa sereke ev nebe ku çi rê hatiye derbas kirin, çimkî beşeke mezin ji vê di dîrokê de hatiye tomarkirin.

Belkû dîroka PDKÎ wê demê herî zêde wateya xwe peyda dike ku ji bîranînekê ya hevbeş bibe sermayeyeke ramanî û siyasî ji bo pêşerojê û bo nifşên din.

Ev dîrok destpêka projeyeke siyasî ye ku mijara wê hîn jî bi dawî nehatiye:
Û tam li vir e ku wateya rastîn a berdewamiya projeyeke siyasî xwe nîşan dide ku sor be li ser parastina armancan bêyî ku siyaseta xwe bixe nav çarçoveya qetîs mayî, parastina koka dîrokî bêyî ku çavê xwe li ser pêşerojê bigire, û veguhastina ezmûna dîrokî bo amadebûneke siyasî ji bo vê demê ku Kurdistan ne tenê mafê baskirina daxwazên xwe hebe belkû ji bo bidestanîna wê mafê û biriyardan li ser pêşeroja xwe jî amade be û xwedî gotarek siyasî be.

# Serwerî û rêkxistina neteweyî
## Ji îradeya Siyasî ber bi îradeya neteweyî: Stratejîya avakirina Serwerîya



N. Nezîr Akat

Têkoşîna neteweyî ne tenê pirsgirêka parastina nasname, ziman û çandê ye, di heman demê de pirsgirêka rêxistina ji bo îradeya neteweyî û ya pêkhateyên Kurdistanê ye . Neteweyek dikare xwedî dîrok, bîranîn, ziman û hişmendiya hevpar be, lê heger hêzên hevpar rêxistineke civakî û siyasî neafirînin, îradeya neteweyî dê nikaribe hêza çarenûsa siyasî bi awayekî aktîf ava bike.

Di vê pêvajoyê de pêwendîya serwerîya neteweyî û rêxistina ji bo têkoşîna neteweyî dibin du aktorên sereke. Serweriya neteweyî armanca siyasî ya îradeya neteweyî ye, rêxistin jî wek amurek sîyasî vê îradeyê wek hêzeke kolektîf lihev dihûne.

Serwerîya neteweyî bêyî îradeya neteweyî pêk nayê, îradeya neteweyî bêyî rêxistinê nikare bibe hêza siyasî ya biryardêr û rêxistina tekoşîna neteweyî jî bêyî beşdarîya aktorên neteweyî-sîyasî nikare îradeya civakê bi awayekî berdewamî û domdarî, bi îradeya neteweyî ve bi encam bike.

### Rêxistina sîyasî û hevkariya neteweyî

Rêxistin tenê damezrandina partî, dezgeh, komele an komîteyekê nîne. Di wateya siyasî de, rêxistina neteweyî pêvajoyeke ku kes, kom û sazî li dora armancên hevpar dicivîne, kar û berpirsiyariyên wan dabeş dikin û kordînasyona hêzên cuda ava dikin.

Bi vê armancê tekoşîna neteweyî bi pêdiviya rêxistina hêzan heye. ger aktorên cuda yên sîyasî bêyî armanc û kordinasyonê herkes bi tena xwe bixebitin, dê ji hêza hevbeş bidûr bikevin û dikarin jar û belav bibin, lê heger yek rêxistin bixwaze hemû civakê di bin kontrola xwe de bigire û organîze bike, piralî, pirrengî, pirdengî û kapasîteya civakî ji dest dide.

Ev metod û şêweyê têkoşînê di stratejîya tevgera Kurdistanî de bi girseyî cî




girtîye û ev şêwe jî bûye astenga sereke li pêşîya avakirina rêxistina neteweyî.

Di tekoşîna neteweyî de modela guncaw “rêxistina rêxistinan” e: aktorên cuda dikarin serbixwe bimînin, ev wek helwesteke xwezayî dikare şîrove bibe, lê di mijarên bingehîn ên neteweyî de hewceye ew bibin beşek ji avakirina mekanîzmayên hevkariyê û kordinasyona neteweyî.

### Taybetmendiya Kurdistanê û aktorên neteweyî

Di çarçoveya tekoşîna neteweyî de, mijar ji kategoriyên çîn û qatan bidûrketî ye. Çîn/sinif di analîza civakê de bêgûman girîng in, lê neteweyek ji çînên cuda pêk tê û dikare li ser armancên hevbeş yên neteweyî xwedî berjewendiyên hevpar bin.

Nimûneyên vê perspektîfê li dinyayê û li Kurdistanê, bi helwestên berhemdar, serketî û di pozîsyongirtina hêzên neteweyî de, di hevbeşîya mafan de wek stratejîyek pozîtîf û erênî hatîye şîrovekirin.

Li vir pirs eve, ji nav civata neteweyekî kîjan hêz dikarin di avakirina îradeya hevpar a neteweyî de beşdar bibin? Bersîva vê pirsê li gor çand, dîrok, hişmendîya neteweyî û civakî helwesta hêzan ji hev cuda ne.

Lê gelemperîyek hevpar heye, ku netewe ji hêzên cuda pêk tê û azadîya neteweyî bi hevkarîya van hêzan ve bi avakirina îradeya neyeweyî ve pêk tê.

Di rewşa civakî ya Kurdistanê de ev pirs herroj bêtir bi gîrîngî û taybetî di rojeva sîyasî ya civata neteweya kurd de cî digre. Di Kurdistanê de ev mijar taybetî girîng e. Dîroka civakî ya Kurdistanê bi yek modela civaka endustriyalî ya homojen nayê ravekirin. Di gelek deveran de malbat, eşîr, ol, dergehên olî, gund, herêm, bazar û têkiliyên civakî yên kevneşopî di avakirina têkiliyên civakê de roleke girîng lîstine.

Ji bilî partî û rêxistinên siyasî, eşîr, malbatên neteweperwer, rewşenbîr, kesayetiyên civakî, şêx, mele û bawermendên neteweyî yên ku ne dijî baweriyên cuda ne, hemû dikarin di avakirina îradeya neteweyî de rolekê bilîzin.

Li vir girîng e pênase bibe ku, beşdariya van aktorên neteweyî, nayê wateya ku eşîr, malbat an sazîyên olî dibin desthilatdarên siyasî yên neteweyî.

Rola wan divê di çarçoveya peymana sîyasî ya neteweyî de li gor yeksanîya dadwerîya gerdûnî, piralî, û pirrengîya civatê, bi armancên neteweyî yên hevpar ve di bin sîvana rêxistina hevbeş de misoger bibe û bi hev re bibin îradeya sîyasî ya neteweyî.

Bi vê şêweya rêxistinî, bawerî û bawermend, bi neteweyîbûn û neteweparêzan re lihev kirîn e. Kes dikare bawermendê olî be û di heman demê de xwedî hişmendiya neteweyî be.

Di rewşa civakî û çandî ya Kurdistanê de, ev rastîyeke neteweyî ye. Ji bo hevkariya neteweyî yekbûna baweriyan ne hewcey e, lewra zêde bawerî li Kurdistanê hene, lê hevpeymana maf û azadîyên neteweyî, olî û bawerîyên cuda, armanca biryardêr e û di berhevkirina hêzan de metodeke serketî xuya dibe.

### Armanca tekoşînê û Serweriya neteweyî

Serweriya neteweyî divê ji serdestîya yek partî, yek serokî, yek eşîr, malbat yan jî ji ideolojiyekê cuda were ravekirin. Formên dewletbûnê bixwe dikare wek Amoreyên ji bo pêkanîna serweriya neteweyî bên pênase kirin, lewra têgeha serweriya neteweyî ji statuya formên dewletê firehtir e.

Lewra her formên Dewletê wateya serwerîya neteweyî îfade nake. Li vir pirs ne mijara mafê neteweyî Ya avakirina dewleta xwe ye.

Pirsa sereke ya serwerîyê ye. Ji ber vê yekê, serweriya neteweyî û dewleta serbixwe ne hevwate ne.

Ji ber vê yekê, serwerî û rêxistina neteweyî di pêvajoyeke dînamîk de bi hev re pêwendîdar in. Lewra tekoşîna neteweyî ne yekrengiya siyasî ye, ew bixwe hevahengiya stratejîk ya tevgera neteweyî û pêkhateyên Kurdistanê ye.

Neteweyek dikare xwedî partî, ideolojî, bawerî û rêxistinên cuda be. Ya bingehîn li vir, cudahiyan bi peymana maf û armancên neteweyî ve bi mekanîzmayên hevkariyê ve avakirina sîvana îradeya neteweyî ya sîyasî ye.

Bi awayekî din, ew kordînasyon û kapasîteya aktorên cuda ye ku helwestên wan di nav îradeyeke neteweyî ya hevpar de dicivîne. Serweriya neteweyî di wateya siyasî de têgîna ku neteweyek xwedî maf û kapasîteya diyarkirina çarenûsa siyasî, civakî, çandî û aborî ya xwe ye.

Em dê bêjin, serweriya neteweyî armanc e, rêxistin amoreye û sîvana aktorên neteweyî jî hêza pêkanîna wê ye. Ger armanc hebe lê kordinasyon tune be, hêz belav dibe.

Heger kordinasyon hebe lê peymana armancên hevbeş tune be, rêxistin dikare bibin komên cuda yên otonom yên rikberên hev. Heger herdu hebin lê kapasîteya çalakiyên civakî û neteweyî tune bin, rêxistin nikare bandora siyasî biafirîne û temînata domdarîya neteweyî misoger bike.

# Nûnasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Veguherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas

**Beşa Pêncem**

Ma Tevgerên Neteweyî di Xwendina Sedsala Bîst û Yekem de Şaş Bûn?

Pirsgirêka tevgerên neteweyî îro ne di dadmendiya daxwazên wan de ye, belkî di awayê xwendina cîhanê de ye. Ji bo gelê Kurd, netewayetî ne zêdebariyeke ramanî ye, ne jî tenê vegereke hestyarî ber bi derbasbûyî ye, ew bingehê mayînê ye li hember nasnekirin, tunekirin û ji warê xwe rakirinê. Lê girêdana bi bingehê dozê ve tiştek e, û hişkbûna li ser amûr û rêbazên serdemên borî tiştek din.

Ji ber vê yekê, pirsa rastîn ne ev e: Ma netewayetî şaş bû? Lê ev e: Ma tevgerên neteweyî, di nav wan de tevgera Kurdistanî, di xwendina sedsala bîst û yekem de şaş bûn?

Ev pirs ne ji bo lawazkirina projeya neteweyî ya Kurdî ye, ne jî ji bo helandina wê di nav têgehên serneteweyî û nezelal de ye. Gelê Kurd hîn jî di nav cîhaneke ramyarî de dijî ku gelek desthilat hebûna neteweyî ya wî nas nakin û mafên wî red dikin. Ji ber vê yekê, aliyê neteweyî hîn jî bingehê her projeyeke rastîn a Kurdî ye. Lê parastina vî bingehî nayê wê wateyê ku tevgera Kurdistanî li nav şêwazên ramanî û rêxistinî yên serdemeke din de girtî bimîne.

Cîhan guherîye. Aborî, teknolojî, medya, dane, dîplomasî û têkiliyên navneteweyî êdî bi awayekî ku sedsala borî nedîtibû bi hev ve girêdayî ne. Dewlet jî êdî tenê xwediyê hemû amûrên bandorkirinê nîne. Ji ber vê yekê, şaşî ne di neteweyîbûna tevgera Kurdistanî de ye; şaşî ew e ku carinan hê jî bi gotar, rêxistin û amûrên serdemeke borî bersiva cîhaneke nû bide.

Di rewşa Kurdistanê de, ev pirsgirêk bi du ezmûnên girîng zelaltir dibe.

Li Başûrê Kurdistanê, ezmûneke ramyarî û rêveberî ya pêşketî derket holê ku karî herêmeke federal bi giraniya siyasî, dîplomasî, aborî û avadanî ava bike. Vê ezmûnê nîşan da ku gelê Kurd, gava derfet û aramî peyda dike, dikare nimûneyeke pêşketî ava bike. Lê herwisa eşkere kir ku pêşketina rêveberî û têkiliyên navneteweyî bi serê xwe têrê nakin, heger ew neyên veguheztin bo projeyeke neteweyî ya dûrnihêr û serbixwetir.

Li Rojavayê Kurdistanê jî ezmûneke cuda ji nav şer û hilweşîna Sûriyê derket holê. Ew di destpêkê de li ser parastina leşkerî û valahiya ramyarî hate avakirin û karî di nav şertên dijwar de ewlehî û aramiyeke kêm-zêde peyda bike. Lê dijminatiya hêzên herêmî, guherîna helwestên navneteweyî, û di heman demê de lawaziya aliyê neteweyî û kêm-bûna giraniya avakirin û pêşketinê, wê li hember guherîna hevsengiya hêzan lawaz kir. Bi veguherînên dawî re, tevgera Kurdî li wir îro zêdetir di rewşa parastina hinek destkeftan de ye, ne firehkirina wan.




Di her du ezmûnan de girêk ne di netewetiyê de ye, belkî di awayê pêkanîna wê de ye. Li Başûrê Kurdistanê, pirs ev e ku serkeftina federal û rêveberî çawa dikare bibe projeyeke neteweyî ya firehtir. Li Rojavayê Kurdistanê jî, pirs ev e ku ezmûn çawa dikare ji rêveberiya rewşa heyî wêdetir here û xwediyê kûrahiya neteweyî û hêza domdar bibe.

Tevgerên neteweyî yên ku di sedsala bîst û yekem de serdikevin, ne ew in ku ji nasnameya xwe dûr dikevin, lê ew in ku bingehê xwe diparêzin û amûrên xwe ji nû ve dişêwînin. Êdî têrê nake ku em tenê bêjin em gelekî bindest in, divê em nîşan bidin ku em xwediyê dîtineke siyasî, damezrandinî, aborî û çandî ne ku projeya Kurdî bike pêşniyareke ciddî ji bo pêşerojê, ne tenê nerazîbûnek li hember dema derbasbûyî de.


Ji ber vê yekê, xwendina nû ya sedsala bîst û yekem nayê wateya derbasbûna ji netewetiya Kurdî, belkî rizgarkirina wê ji hişkbûnê ye. Nayê wateya dûrketina ji Kurdistanê; lê ew e ku Kurdistan tenê xewneke hestyarî ya ji pêdiviyên serdemê qutmayî nemîne. Nayê wateya redkirina dîrokê; lê pêşîgirtina li wê yekê ye ku dîrok bibe bendek li ber avakirina pêşerojê.

Ji bo gelê Kurd, ev dem dikare dema venêrîn û nûbînînê be, ne dema tirsê. Kurd xwediyê dîrokeke dewlemend a tekoşînê, ezmûnên siyasî yên cuda, hêza mirovî û çandî ya berfireh in. Ya ku kêm e ne dadmendiya dozê ye, belkî nûkirina şêwaza wê ya siyasî û dîrokî ye bêyî ku bingehê wê bê guhertin.

Ji ber vê yekê, pirsa rastîn ne ev e ku ma tevgerên neteweyî dawî li wan hatiye; pirsa rastîn ew e ku ma ew dikarin xwe ji nû ve ava bikin bêyî ku ruhê xwe winda bikin. Bi taybetî ji bo tevgera Kurdistanî, serkeftina pêşerojê bi qasî girêdana wê ya bi dozê ve, bi qasî şiyana wê ya têgihiştina serdemê û ji nû ve avakirina projeya neteweyî li ser bingehên jîrtir, nermtir û rastîtir ve girêdayî ye.

**Berdewam dike...**

# Ji reşkirina nasnamê ve bo serbixweyî ya hizrî, Ciwanên Kurdistanê û avakirina jêrxana civakê



N. Sîbel Xubayî

Dema em behsa rol û şiyana ciwanan bo guhertin û pêşxistina civakê dikin, nabe rewşa taybet a civaka Kurdistanê û ew rastiya dîrokiya dijwar bê jibîrkirin ku ciwanên me tê de perwerde bûne. Ciwanên Kurdistanê tenê tiwêjek nîn in li nav civakê de, belkî hilgirê giraniya dîrokekê ne ku têde rûbirûyê siyaseta dagîrkeran, reşkirina nasname, şer û awareyiyê bûne, bo têgeheştin li bandora ciwanan li Kurdistanê de, dibe li du aliyan de em mêzêyê wê pirsê bikin, wekî qurbaniya destê dagîrkerên dîrokê, û wekî bizvînera rastîn a rizgarbûna hizrî û serbixweyî ya abûrî û civakî.

Li dîtingeha dîrokê de, dagîrkerên Kurdistanê hertim amanca serekeye wan têkşikandina Îradeya ciwanan bûye, çimkî zanîne pêşeroj û mana wî welatî girêdayî ye bi tendirûstiya hizrî û cesteyî ya nivşa nû, li bêbeşkirina wan li hînbûn bi zimanê dayîkê û sepandina kultûra dagîrker, heya digehe pêlên asmîlasyon û hewldan bo bê hêvîkirina wan û neçarkirina wan bi koçberiyê, hemû ew mijarane li kêmkirina şiyana ciwanan de bandor hebûne, ew givaşên berdewam zirarek mezin gîhandine jêrxana mirovî a Kurdistanê û astengiyên mezin li pêş geşeya xwezayî a civakê çê kiriye.

Lê tevî hemû wan birînan de, dîroka Kurdistanê eva selmandiye ku ciwan ne tenê teslîmê îradeya dagîrkeran nebûne, belkî bûne pêşengê parastina çand û nasnameya netewî, erkê îro yê ciwanên Kurdistanê li geşepêdana civakê de li çend aliyên sitratejîk de xwe dibîne.

**1 - Parastina nasname û şerê hizrî û ragehandin:** Li serdema şerê nerim de, dagîrker pitir hewla dagîrkirina hizir û hişê ciwanan didin, ciwanên Kurdistanê li rêya bikaranîna emrazên nû yên wekî teknelojiya, media, wêje û huner, dikarin dengê rastîn ê neteweya xwe bigehînine cîhanê û rûbirûyê çewtekariyên dîrokê bibin, nivîsîna dîrokê û bi destê me û belavkirina wê bi zimanên cîhanî karek girîng a ciwanên niha û wî serdemî ye.

**2 - Avedankirina jêrxanên abûrî û serbixwe a darayî:** Bo rizgarbûn li cureyên din ên girêdayîbûnê û bindestiyê, Ciwanên Kurdistanê hewce ye pêşeng bin li avakirina abûriyek xweragir, weberhênan li hizra nû de, warên afirandina kar, pêşwebirina werzigarî û çandiniya serdemiyane û bikaranîna zanista roj, wisa dike civaka Kurdistanê li rûyê abûrî ve serbixwe û berhemhêner be, neînkû tenê bikarhêner be.




**3 - Avakirina civakek zanistxwaz û hişmend:** Dagîrkar hertim hewil dide ku civaka dagîrkirî li nezanî û li paşkeftinê de bihêle, bersiva bihêz a ciwanên Kurdistanê bo wan pîlanan, bidestxistina bilindtirîn asta zanist, xwe perwerdekirin li zanîngehên navdar ên cîhanê, û veguhastina wê zanistê ye bo navxweyê Kurdistanê, ronakbîrkirina civakê beramber mafên xwe û bihêzkirina bingehên mafê Mirovî, civakê li zehmetiyan diparpêze û pêş dêxe.

**4 - Bihêzkirina Yeketiya civakî û redkirina cudatî û netebayî yê:** Yek ji destkeftên dagîrkeran çêkirina netebayî û çen cergetiyê bûye, ciwan dikarin bi hizirkirina serdemyane û derbaskirina sînorên deverî û hizbiyan, yekgirtîbûna civakî bipêk in, karên xwebexş, avakirina torên hevkarî û berevanî li parên dine yên zirardîtî ên civakê, ku ruhê yekîtiya netewî bihêztir dike.


Di dawiyê de ciwanên Kurdistanê herçiqas qurbaniyê destê dîrokek tejî li zilim û sitemê bûne, lê hevdem mezintirîn hêvî ne bo serkeftinê, guherîna azaran bo hêza karkirinê, û guherîna rojreşiyan bo pêşerojek zanistî û pêşkeftî, ew rêya ye ku ciwan dikarin Kurdistanê ber bi gupka herî bilind a pêşkeftin û rizgariya yekcarekî ve bibin.

## Nerîna Lîderan



**“Mistefa Hicirî”:**

**“Tevgera neteweyî ya Kurdistana Îranê, xwediyê projeyeke siyasî ya zelal û modern e ji bo paşeroja Îran û Kurdistanê, ku li ser bingehê mafê diyarkirina qederê û dêmokrasya beşdarbûyî hatine çêkirin.”**



**“Donald Trump”:**

**“Ger pêwîst be, ez ê sed caran êrîşî Îranê bikim”**



**“Elî Zeydî”:**

**Girtina Tengava Hormuzê dijwariyeke mezin e”**



**“JD Vance”:**

**“Givaşên aborî amûra herî bibandor” a Amerîkayê li dijî Komara Îslamî ye, lê di heman demê de ew “lîstikek pir hesas e.”**

# 25ê Gelawêjê: Sîmbola Berxwedana Neteweyî û Rêya Azadîxwaziya Kurdistanê



N. Eskender Ceiferî




25ê Gelawêjê di dîroka hevçax a neteweya Kurd de ne tenê rojeke asayî ye, di heman demê de xala guherînê ye di têkoşîna siyasî, netewî û rizgariyê de. Di vê rojê de, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê (PDKÎ) hate damezrandin û mîrateke mezin a xwebexşîn û berxwedanê li dijî zordarî û dagirkeriyê afirand. Damezrandina PDKÎ bersiveke dîrokî û pêwîst bû ji bo hemû siyasetên asîmîlasyon, înkar û serdestiya ku ji aliyê rêjîmên dagirker ve li ser bingeha navenda desthilatdariyê hatibûn ferzkirin.

Têkoşîna ku di 25ê Gelawêjê de hate ragihandin, berdewamî û encama rasterast a xebata dîrokî ya Komeleya Jiyanewey Kurd (J.K.) bû. Komeleya J.K. di tebaxa 1942an de li Mehabadê ji aliyê komeke ronakbîr û nîştimanperwerên Kurd ve hatibû damezrandin.

Vê rêxistinê bingeheke bihêz a hişyariya netewî afirand û cara yekem di dîroka nûjen a Kurdistanê de karîbû rêxistineke sîstematîk û modêrn bîne holê. Komeleya J.K. ne tenê tevgereke siyasî bû, belkî tevgerek çandî û civakî bû ku alaya netewî û pênaseya Kurdî di nav civakê de zindî kir.

Ji bo derbasbûna ber bi qonaxeke nû ya xebata siyasî, damezranêrên J.K.ê biryar dan ku rêxistinê firehtir bikin û bi vî awayî di 25ê Gelawêjê de Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê hate ragihandin. Pêşengiya vê guherînê Şehîd Pêşewa Qazî Mihemed bû ku karî vê mîrata pîroz, bike bingeha avakirina yekemîn Komara Kurdistanê.

Ji roja yekem a avabûna xwe ve, PDKÎ alayê têkoşîneke piralî ji bo misogerkirina mafên netewî yên neteweya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bilind kir. Dîroka vê partiyê, dîroka têkoşîneke mezin e ku li dijî du rêjîmên dîktator û dagirker, ya Pehlewî û rejîma Paşverû ya Komara Îslamî hatiye meşandin. Her du aliyan jî tenê yek armanc berdewam kirin: Hewla jinavbirina nasnameya Kurdî, talankirina çavkaniyên Kurdistanê, û parçekirina yekîtiya cografî û çandî ya netewa me.

**Dagirkeriya li ser Kurdistanê tenê zewtkirina axê nîn e, ew hewldanek e ji bo tinekirina ruhê azadîxwaziyê û tefşkirina ziman, dîrok û rûmeta Kurdan. Di vê çarçoveyê de, 25ê Gelawêjê bûye xala rawestana li dijî vê metirsiya li ser hebûnê. Bi dirûşm û hêla xwe ya siyasî, PDKÎ karîbû hişyariya netewî di nav civakê de kûr bike û tevgerekê ava bike ku ne tenê li hember zordariyê rawestiya, belkî azadî û dêmokrasiyê wekî take altêrnatîv ji bo pêşeroja herêmê nîşan dide.**

Di tevahiya van salan de, rêjîmên dagirker bi hemû amûrên xwe yên leşkerî, ewlehî û propagandayê hewl dane ku agirê têkoşînê li Rojhilat bi dawî bê.

Lê belê, berxwedana Kurdistanê û domdariya rêbaza 25ê Gelawêjê nîşan da ku xwesteka azadiyê ji hemû çek û zordariyan bihêztir e.

Şehîdbûna rêberên mezin ên mîna Qazî Mihemed, Dr. Ebdulrehman Qasmlû û Dr. Sadiq Şerefkindî, ne tenê nebû sedema lawazbûna vê tevgerê, belkî soza netewa Kurd bo domandina rêya wan kûrtir û xurtir kir. Dagirkeran hesab nedikir ku ramana azadiyê bi gulle û têrorê nayê kuştin, ew tîrêja ku di 25ê Gelawêjê de hate pêxistin, îro bûye agirgehek geş di dilê her ciwanekî Kurd de.

Siyaseta dagirkeran a li ser bingeha hejarkirina sîstmatîk, darvekirina ciwanan, mîlîtarîzekirina bajarên Kurdistanê û zextên li ser girtiyên siyasî, hemû nîşanên bêdesthilatdarî û tirse ne di hember hivî û daxwaziyên Kurdan de. Kurdistan îro wek kela berxwedanê rawestiya ye.

Têkoşîna ku di 25ê Gelawêjê de dest pê kir, di nava hemû serhildanên paşîn de ji şoreşa ‘Jin, Jiyan, Azadî’ heya hemû tevgerên sivîl û xwepêşandanên li kolanan, bandora xwe ya rasterast nîşan daye. Ev mîrat, îro di nav hemû beşên civakê de zindî ye.

Salvegera 25ê Gelawêjê ne tenê bîranîna bûyereke dîrokî ye, belkî nûkirina peymanê ye bi şehîdan, girtiyên siyasî û hemû xebatkarên rêya azadiyê re. Ew rojek e ku divê yekîtî û hevkariya navxweyî ya Kurdistanê xurtir bibe da ku bi yekdengî li dijî dagirkeriyê were rawestan. Heya ku dagirkerî û zordarî li ser axa Kurdistanê bimîne, agirê têkoşînê û ruhê 25ê Gelawêjê dê bimîne.

Di vê salvegera pîroz de, silav ji bo bîranîna hemû şehîdên riya azadiyê, silav bo vîna bihêz a girtiyên siyasî, û silav bo berxwedana bêwestan a netweya Kurd li dijî dagirkeriyê. Rêya azadî û serkeftinê dê berdewam bike!

# Di hejmara vê carê a Rojnameya Agirî de Hesen Mukerem li ser 25ê Gelawêjê û berdewamiya xebata PDKÎ, digel rêzdar Mihemedsalih Qadirî Kadirê Siyasî ye PDKÎ hevpeyvîn encam daye



Hevpevîn. Mihemedsalih Qadirî

Hevpeyvînkar. Hesen Mukerem

**Mihemedsalih Qadirî: "Sedema man û berdewamiya Hizba Dêmokrat di heyama heşt dehsalên têkoşîna tijî ewraz û nişîvên dijwar de, vedigere ser rêçika wê ya neteweyî û nîştimanî, baweriya kûr bi dêmokrasiyê û dadmendiya civakî, rêzgirtin li ramanên cuda û hewldana ji bo çareseriya siyasî û aştiyane ya pirsa kurd. Pêbendbûna Hizba Dêmokrat bi van têgihên serdemiyane û di heman demê de pratîkî, rewabûn û berdewamiya vê hizbê misoger kiriye."**

**1 - Felsefeya sereke ya damezrandina Hizba Demokrat çi bû?**

Damezrandina Hizba Dêmokrat a Kurdistanê di sala 1945an de li ser bingeha «Komeley Jiyanewey Kurd» (J.K), hem berdewamiya pirsa neteweyî bi şêwazekî serdemane bû, hem jî guhertin û nûjeniyeke pratîkî bû di gotar û destnîşankirina stratejiya neteweyî de. Ew gavên di wê serdemê de wekî pêwîstiyekê ji bo bersivdana hin rastiyên dîrokî bûn, pêşengên wê serdemê yên kurdan karîn bi xwendineke rastbînane ya rewşa bi bandora hêzên hevalbend ên serketî yên Şerê Cîhanî yê Duyem ve li ser hevkêşeyên herêmî û herwisa li qada navxweyî ya Îranê, bi nirxandineke hûr a rewşa siyasî, têkoşîna gelê kurd ji bo bidestxistina armancên wan xurtir bikin.

Di rastiyê de damezrandina Hizba Dêmokrata Kurdistanê valahiyeke dîrokî nebû, belkî berdewamiya rêxistina «Komeley Jiyanewey Kurd» (J.K) ya sala 1942an bi şêwazekî serdemane bû. Ev nîşan dide ku Hizba Dêmokrat di rastiyê de gaveke bilindtir a rêxistinî bû ji bo têkoşîna neteweyî. Guhertina paradîgmaya siyasî (J.K) ber bi Dêmokrat ve, nûjeniyeke gelek giring e, çimkî J.K zêdetir li ser bingeha neteweperweriya klasîk, veşartî û girtî bû, Lê damezrandina Hizba Dêmokrat nîşana derbaskirina qonaxa «rêxistina nepenî» ber bi «partiyeke siyasî ya moderin» û xwe guncandina rastbînane bi pêkhateya civaka Rojhilatê Kurdistanê û jîngeha siyasî ya Îranê bû. Ev guhertin, bi taybetî di warê gotar û stratejiyê de, ji bo rastiyên wê serdemê gaveke jîrane bû.

Bi taybetî faktora navneteweyî ya Şerê Cîhanî yê Duyem bû sedem ku pêşengên wê serdemê (bi taybetî Pêşewa Qazî Mihemed) karibin rewşa jeopolîtîk a piştî şer baş bixwînin, xasmanî bandora zilhêzeke wekî Soviyetê di hevkêşeyên Îranê de, wekî derfetekê ji bo vejandina doza kurd bi kar bînin. Ev têgihiştin, nîşana «realpolîtîk» ango siyaseta rastbînane ya wê serdemê ye.

Ji aliyekî din ve, parastina hevsengiya siyasî ya navxweyî li Îranê di wê serdemê de gelek giring bû. Hizba Dêmokrat ji bilî têgihîştina ji rewş û kavdanên derveyî, bi li ber çav girtina rewşa siyasî ya navxweyî ya Îranê û pêkanîna hevalbendiyê li gel hêzên dêmokrasiyxwaz ên îranî hat damezrandin. Ev yek têgihiştina rêberên Kurd li ser «têkiliyên navend û digel nenavendê» nîşan dide. Lewma, damezrandina vê hizbê wekî bûyereke bi hilkeft nayê hejmartin, belkî wekî hewldaneke hişmendane, pratîkî û di çarçoveya rastiyên jeopolîtîk de tê şîrovekirin.

**2 - Di qonaxên dijwar de, sedema wê çi bû ku Hizba Dêmokrat li ser piyan ma û berdewam bû?**

Sedema man û berdewamiya Hizba Dêmokrat di heyama heşt dehsalên têkoşîna tijî ewraz û nişîvên dijwar de, vedigere ser rêçika wê ya neteweyî û nîştimanî, baweriya kûr bi dêmokrasiyê û dadmendiya civakî, rêzgirtin li ramanên cuda û hewldana ji bo çareseriya siyasî û aştiyane ya pirsa kurd. Pêbendbûna Hizba Dêmokrat bi van têgihên serdemiyane û



di heman demê de pratîkî, rewabûn û berdewamiya hizbê misoger kiriye. Hizba Dêmokrat rîşedartirîn rêxistina siyasî ya serdemiyane ya kurd e ku karîbû «hişmendiya neteweyî» bike tevgereke cemawerî ya siyasî ya rêxistinkirî û berdewam. Lewma mayîn û felsefeya rewabûna Hizba Dêmokrat di wê de ye ku her gav xwe wekî berpirsiyarê sereke yê parastina doza neteweyî û nîştimanî dibîne.

**3 - Cudahiya di navbera «J.K» û «Hizba Dêmokrat» de çi bû? Û çima ev veguhestina dîrokî hewce bû?**

Dibe bêjim ku piştî bidawîbûna Şerê Cîhanî yê Duyem, «J.K» çalakiyên xwe yên siyasî rawestand û di encamê de navê xwe kir «Hizba Dêmokrat a Kurdistanê». Di vê guhertinê de, bingehên Jêkafê ber bi bernameyeke zelal û diyar ve guherîn. Di dîroka wê serdemê de, çawaniya tevlîbûna guhertinên mezin ên Îranê, bi taybetî sûdwergirtina ji rewşa dawiya Şerê Cîhanî yê Duyem û hebûna hêzên hevalbend li ser beşeke mezin a axa Îranê û Rojhilatê Kurdistanê, erkeke giran û berpirsiyariyeke dîrokî xistibû ser milê Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî. Diviyabû wan bi li ber çav girtina sînorên navneteweyî û herêmî, têkiliya navbera armancên neteweyî û rastbîniya siyasî bi şêwazekî rêk bixin ku tevgera rizgarîxwaza kurd li gel rastiyên nû yên wê serdemê biguncînin.

Lewma, guhertina navê «Jêkafê» bo «Hizba Dêmokrat», gaveke siyasî ya jîrane bû ji bo ku karibin daxwaz û armancên Kurdistanê di dirûşmeyeke taybet de sînordar nekin, heta ku karibin di wê derfeta dîrokî de destkeftiyekê ji bo neteweya kurd bidest bixin. Piştî damezrandina Hizba Dêmokrat em dibînin Qazî Mihemed û serkirdeyên hizbê, yên ku karîn Komara Kurdistanê damezrînin, asoyeke dûrtir û berfirehtir di asta xweseriyê de di nav Îranê de ji bo paşeroja gelê kurd didîtin.

**4 - Bernameya siyasî ya Hizba Dêmokrat di vê qonaxa niha de çawa dikare bersivdêra guhertinên siyasî û daxwazên nû yên civakê be?**

Di vê qonaxê de Hizba Dêmokrat li hember berpirsiyariyeke dîrokî de ye. Em dibînin Rojhilata Navîn li ber destê guhertineke jeopolîtîk û dîzaynkirineke siyasî, aborî û ewlehiyê ya mezin de ye û milmilanêya aliyên herêmî û navneteweyî ji bo ragirtina hevsengiya berjewendiyên wan, bi taybetî li dijî rejîma Îranê, rehendên berbelav girtine pêş.

Di heman demê de civaka îro ya Kurdistanê, gelek ji serdema damezrandina Hizba Dêmokrat û rejîma padîşahî an dema hatina ser desthilatê ya Komara Îslamî cuda ye. Di vê qonaxê de em dibînin ku civaka Kurdistanê ji aliyê geşepêdana siyasî û civakî ve çend pêşketî ye û nifşên nû û aktorên siyasî yên nû derketine meydanê. Lewma hewce ye Hizba Dêmokrat zêdetir cehdê bike vê piralîbûnê di pêkhate û gotara xwe de nîşan bide, di heman demê de wekî hêzeke yekxer û berdewam di nav tevgera rizgarîxwaza Rojhilatê Kurdistanê de rola pêşengiyê bibîne û gotara xwe ya neteweyî û nîştimanî, li gor rastiyên civaka xwe, di çarçoveyeke berfirehtir de pêş bixe.

**Spas bo rêzdar Mihemedsalih Qadirî.**

# Ji Fermana Cîhadê Heta Herifîna Koşka Wilayetê



N. Şemal Terxîbî



28ê Gelawêjê ya sala 1358ê, ne tenê dîrokek di rojjimêrê de, belkî xaleke werçerxana stratejîk bû di dîroka hevçerx a Kurdistana Îranê de. Di wê rojê de, dema Xumeynî fermana “Cîhad”ê li dijî gelê Kurd derxist, şerekî hemîaliyane, ku heta niha jî berdewam e li dijî gelê Kurd, dest pê kir şerek ku di felsefeya Komara Îslamî de, her cûre daxwazeke mafxwazane ya derveyî desthilat û nêrîna Wilayeta Feqîhî wekî “cudayîxwazî” pênase dikir. Lê ev biryara reş û qirêj, di şûna teslîmbûnê de, bû hêvênê çêbûna destanekî dîrokî ji berxwedana neteweyî ku di şêwaz û rehendên cuda de, heta îro ku sala 1405ê ye, berdewam e.

Paş rûxana rêjîma paşayetî di sala 1357an de, xelkê Kurdistanê ku bi dehan sal bacên tepeserkariyê dabûn, bi şêwazekî medenî û rêkxistî dest kirnebi damezrandina «Şêwr û Komîteyên Xwecihî» da ku di îdaredana siyasî û civakî ya xwe de beşdar bin, belê desthilatdarên nû yên Tehranê ku têniyê takrewî û sepandina îdeolojya xwe bûn, di şûna dabeşkirina desthilatê û damezrandina sîstemekî dêmokratîk, rêya agir û asin hilbijartin. Zûtir ji her aliyekî, êrîşa xwînawî birin ser bizava karkirî û xwendekarî li Turkmensehra, Ehwaz û Belûçistanê, û tova duberekî di navbera neteweyên Îranê de çandin.

Li Kurdistanê, bi hevkarîya desthilatdarên herêmî û komîteçiyan, tawanên mezin li gundên wekî Qarne, Qelatan, Îndirqaş û Dîlançerx hatin encamdan û sêdarên Sadiq Xelxalî di dadgehên 2 deqîqeyî de, cesteyê lorîkên vê xakê kirine amanc.

Zêdebarî vê qirkirin û kuştarê, Kurdistan nekefte qedeman. Berxwedana gernasane ya bajarên Sine, Seqiz, Bane, Mehabad û Pawê, xewna dagirkeran kir bi bilqa ser avê. Diyartirîn û dîrokîtirîn nimûneya vê berxwedanê, «Şerê 27 Rojî yê Bajarê Sine» bû. Dema Benîseder, fermandarê giştî yê hêzên çekdar yên wê demêye rêjîmê, ferman da ku artêş heta pakijkirina Kurdistanê “pêlavên xwe dernexe”, bi bombebarankirina taxan û topbarankirina welatiyan, Sine kirine nav xwînê, belê îradeya gel ew tûşî şkestin û serşoriyê kirin. Berxwedan ku paşê bi fermî wek «Roja Xwe-ragirtina Neteweyî» hat navkirin.

Îro, paştî derbasbûna 47 salan ji fermana qirêj a cîhadê, hawkişeya navxweyî, herêmî û cîhanî bi temamî berewajî bûye. Em niha di qonaxekê de dijîn ku tê de Komara Îslamî ne tenê ev gefûgur û tirsandina destpêka şoreşê pê re nemaye, belkî di nava herifînekî qewareyî û leşkerî, ewlehî û aborî de ye. Spaha Pasdaran û kesên girêdayî bi Wilayeta Feqîhî ku rojekê bi fermana cîhadê û darvekirinê li Kurdistanê manovr didan, îro di bin zexta qeyranên navxweyî û herêmî de, binyata fermandariya wan tûşî herifînekî kûr bûye.

Di bersiva vê daxuyaniya hestiyar de û ji bo destserdagirtina paşerojê, rastiyeke zanistî ya dîrokî hatiye selmandin ku serkevtina dawî bêyî yekrêzî û hevdengiya navmala Kurd nayê dîtin. Ji vir ve bû ku hewcedariya dîrokî, hêzên siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê gihand xala werçerxana din, damezrandina «Hevbendiya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê» di rêkefta 3yê Reşemeya sala borî de. Ev hevbendî bersiveke kirdarî û siyasî bû ji bo hemû wan cehdên ku dixwestin bizava Kurd belav bikin. Ev gav nexşerêyeke ronî da xebata rewa ya gelê me da ku bi yek dengî û eniyekî bihêz ve rûbirûyê dawî demên temenê rêjîmê bibin.

Fermana cîhadê ya 1358an xwast tevgera Kurdistanê ji rêya dîrokê bibire, belê 47 sal berxwedana berdewam û gihîştina bi yekrêziya siyasî selmand ku îradeya gel ji fermana dîktatoran bihêztir e. Di vê peywendiya dîrokî ya sala 1405an de, dema ku ihtimala herifîna yekcarî û dawîhatina temenê reş û biyom ê rêjîma totalîter a Komara Îslamî ya Îranê ji her demê nêzîktir bûye, Kurdistan bi heman ramana sekular, dêmokratîk û bi piştevaniya «Hevbendiya Hêzên Siyasî», wekî sengera bingehîn a guhartinê li Îranê rawestiyaye.

Ew agirê ku di 28ê Gelawêjê de ji bo şewitandina Kurdistanê hatibû hilkirin, di sala 1405an de li ser destê yekrêziya gelê me, bûye meş’elek ku dawiyê bi taritiya Wilayeta Feqîhî tîne.

# Rastnivîsandina ‘u’ ya navberê li ciyê ‘û’ di kurmancî de




N. Azad Kurdî

Ji temenê 20 saliyê ve ye ku ez evîndarê zimanê Kurî me. Ji ber qedexekirina zimanê Kurdî li Îranê di sîstema perwerdeyê de, min hergav dixwest û hêvî dikir ku zimanê xwe bi başî fêr bibim, nas bikim û di hemû astên jiyana xwe de bikar bînim. Yekemîn car di jiyana xwe de ez di kovara Sirwe de li Urmiyê fêrî alfabe û peyvên Kurdî bûm. Piştre dema di 20 saliyê de ez bûm Pêşmerge, her zû min dest bi fêrbûn û xwendina berhemên wêje, rêziman û hemû astên zimanvaniya Kurdî û bi taybet Kurmancî kir ku hêvî û xweziya min bû di jiyanê de.

Di hemû zimanên cîhanê de û Kurdî di nav de jî, piştî rêziman û ferhengan, rasnivîsîn bingeheke mezin e. Mirov dikare bibêje, yek ji pêkhateyên bingehîn ên ziman, rasnivîsîn e. Di zimanê kurdî de weke hemû zimanên din ên cîhanê, bona cudakirina navdêr, peyv, lêker û hevokan, tîp an peyvavek heye ku piranî ‘û’ tê bikar anîn. Di hemû zaraveyên zimanê Kurdî de bi dengê sivik, anku ne stûr tê bilêvkirin. Weke « Kurd û Kurdistan », « dayîk û bab », « keç û kur », « dar û ber » û … Bi giştî di hemû zaraveyên Kurdî de weke hev ev tîp û dengdêr tê bikaranîn, ger em bala xwe bidinê bi dengê stûr nayê gotin û bilêvkirin, lê em bi dengê stûr dinivîsin. Lê di zaraveyê Kurmancî û bi tîpên Latînî de hetanî niha bi ‘û’ tê bikaranîn, anku bi dengê stûr. Bo mînak weke: ‘dûr’, ‘kûr’, ‘sûr’, ‘bûn’ û … .

Li gor standardên rastnivîsandin û rêzimanvaniyê be, ev dengdêr ne stûr e yê ku di navbera du peyvan de bona bi hev re girêdana wan tê bikaranîn. Dengê ‘û’ di zimanê Kurdî de bona gelek navdêr, peyv û lêkran zêde bikar tê, bi taybet jî di zaravê Kurmancî de. Lê dema em bala xwe bidin çawaniya bilêvkirina wê, ev yek bi tevahî şaş tê bikaranîn û nivîsandin. Em qet di zimanê Kurdî de nabêjin: ‘Kurd û Kurdistan’, ya durist ev e li gor bilêvkirinê: ‘Kurd u Kurdistan’. Dengê « û » ku di navbvera peyên ‘Kurd’ û ‘Kurdistanê’ de tê bikaranîn, ne stûr e, ev yek dengê ‘u’ yê zirav û sivik e. Di zaraveyên din de ev deng bi sivikî tê bi karanîn û nivîsandin, di alfabeya Aramî de jî bi yek ‘u’ tê nivîsandin, li cihê du ‘u’yan ku dike « û » ! Ez gelek sal in vê yekê di nivîsên xwe de bikar tînim, lê herdem dizanim ku di warê zimanvaniyê de şaş e.





Kurd deyndarê hindek zimanzanên xwe ne wekî: Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Qanatê Kurdo, Reşîdê Kurd, Osman Sebrî û gelek zimanzanên din ku di van 50 salên borî de xwe bi zindîkirina zimanê me xwe westandin. Hetanî nihad di rojname, pirtûk û medyayên Kurdî de ‘û’ bikar tê. Wan zimanzanan bi hindek awayên cuda bikar anîne, ligel hinek dengên din jî bi cuda. Ez bawer im diviya em bona navbera hemû wan rengdêr, peyav û hevokan bi dengê ‘û’ yê stûr bikar bînin ku ez şaşiyeke mezin dizanim. Ez hêvî dikim ku ev yek bibe mijara nîqaşa zimanzanên Kurd di pêşerojê de ku em bikarin li gor bilêvkirina wê, di hevokên xwe de bikar bînin.

# Qasimlo ne tenê bîranînek e, ew hêviyek e ku ji nifşekî bo nifşekî derbas dibe



N. Sefiye Xalidî



Çima vîzyona siyasî ya nemir Dr. Qasimlo hîn jî di nava nifşê ciwan de deng vedide. Ji bo gelek Kurdên ciwan ên rojhilatê Kurdistanê, Dr. Ebdulrehman Qasimlo ne tenê kesayetiyekî dîroka siyasî ye, belku ew nûnertiya ramaneke siyasî dike ku tevî derbasbûna bi dehan salan piştî şehîdbûna wî jî ev ramana siyasî winda nebûye: demokrasiya li Îranê, diyarkirina çarenivîsa siyasî, û naskirina nasname û mafên Kurdan. Nêrîna wî ya siyasî bi gelemperî di vê prensîba bingehîn de dihat kurtkirin: "Dêmokrasî ji bo Îranê, Xudmuxtarî ji bo Kurdistanê."

Girîngiya Dr. Qasimlo ji bo nifşê îro, ne tenê di daxwazên wî yên siyasî yên berbiçav de ye, belku di wê awayê têgihiştina wî ya ji bo têkoşîna Kurdî de ye jî. Wî nasnameya Kurdî bi dêmokrasiyê, mafên mirovan, beşdariya siyasî û Îraneke piralî ve girê dida.

Di heman demê de, ew ne li wê baweriyê de bû ku pirsgirêka Kurdî dikare tenê bi rêka leşkerî were çareserkirin, bi taybetî di dawiya jiyana xwe de, wî parêzvaniya danûstandin û çareseriyên siyasî û aştiyane dikir.

Heke nifşekî nû wan wekî beşek ji nasnameya xwe bipejirîne, dibe ku ramanên siyasî ji alîgirên xwe zêdetir bijîn. Hêjahiya mayinde ya Dr. Qasimlo jî tam di vê xalê de ye.

Ciwanên îro bi derfetên cuda li gorî nifşê Dr. Qasimlo mezin dibin. Ew digihîjin medyaya civakî û nîqaşên navneteweyî yên derbarê mafên mirovan û dêmokrasiyê de, herwiha dikarin ji perspektîfên cihêreng derbarê dîroka civaka xwe de agahiyan bi dest bixin.

Digel vê yekê, ew rastî wan pirsan tên ku bi dehan sal berê mijara sereke ya hizra Dr. Qasimlo bûn: Divê kêmnetewe xwediyê çi mafên siyasî bin? Çawa dikare nasnameya çandî û zimanî were parastin? Gelo di Îraneke pirreng de, wekheviya siyasî dikare çawa be?
Ji ber vê yekê, dîtina wî ya siyasî li cem hin ciwanên kurd ne wekî tiştekî serdemeke borî, belkî wekî projeyeke siyasî ya neqediyayî xuya dike.!

Ji nêrînên psîkolojîk û sosyolojîk ve, sembolên hevpar dikarin ji bo civakan roleke girîng bilîzin. Gava mirov ji bo demeke dirêj hîs dikin ku ziman, çand an daxwazên wan ên siyasî bi têra xwe nayên naskirin, ev yek ne tenê dibe sedema bêhêviyeke siyasî, belkî metirsiya bêhêvîbûn û teslîmbûna siyasî jî çêdike.

Bîranînên hevpar, kesayetiyên dîrokî û mînakên siyasî dikarin li dijî vê pêvajoyê bisekinin. Ew vê peyamê radigihînin: dîroka me girîng e, daxwazên me xwedî dîrokekê ne, û têkoşîna me ya ji bo bidestxistina mafan, tenê bi nifşekî dest pê nekiriye.

Bi vê wateyê, ji bo gelek kesan Dr. Qasimlo dikare ji tenê serokekî berê yê hizbekê zêdetir be, ew bûye sembola berdewamî û hêviyê.

Ev nayê wê wateyê ku hemû Kurd xwediyê heman nêrînên siyasî ne an jî hemû ciwanên Kurd piştgiriyê didin rêça siyasî ya Dr. Qasimlo. Civaka Kurd ji aliyê siyasî ve piralî ye.

Lê belê, tam ev piralîbûn e ku nîşan dide çima kesayetiyên dîrokî yên wekî Dr. Qasimlo hîn jî bi awayên cûda tên nîqaşkirin û şîrovekirin.

**Civakek ku bi salan e ji bo naskirin, wekhevî û mafên siyasî têdikoşe, pêdiviya wê ne tenê bi rêxistinên siyasî heye, belkî pêdiviya wê bi bîranîn, hêvî û vîzyoneke ji bo paşerojê jî heye. Kesayetên wekî Dr. Qasimlo dikarîn di vî warî de roleke taybet bilîzin. Ew dibin xalên referansê ku rê nîşanî nifşekî didin û nifşê li pey wan jî dîroka xwe bi wan ve girê dide.**

Ji ber vê yekê, ji bo gelek kesan, mîrateya wî ne di wê yekê de ye ku mirov hemû biryarên wî yên siyasî yên wê demê bê guhertin bipejirîne.

Belkî, ev yek dikare wateya berdewamkirina pirsa wî ya bingehîn be: Gelo çawa Îranek dikare derkeve holê ku tê de Kurd bikaribin bi awayekî azad ziman, çand û nasnameya xwe ya siyasî bijîn û di heman demê de bibin welatiyên wekhev ên welatekî dêmokratîk?

Tam ji ber vê yekê ye ku navê Dr. Qasimlo, bi dehan salan piştî mirina wî jî, hîn jî deng vedide.

Rêberekî siyasî dikare bimire, lê ramaneke ku ji aliyê nifşekî nû ve wekî çavkaniya hêviyê tê dîtin, dikare bidome.

Ji bo gelek ciwanên Kurdên Rojhilatê Kurdistanê, ji ber vê yekê ye ku Dr. Qasimlo ne tenê kesayetiyekî derbasbûyî yê ye, belkî sembola destbernedan ji hêviya bidestxistina mafên siyasî, rûmet û pêşerojeke demokratîk e.

Peyama Nifşê Ciwan ew e ku em Dr. Qasimlo bi bîr tînin, ne ji bo ku em di derbasbûyî de bijîn, belkî ji bo ku em vîzyona wî ya siyasî pêşve bibin.

Nifşê me banga Kurdistaneke dêmokratîk dike ku tê de Kurd bikaribin bi awayekî azad ziman, çand û nasnameya xwe ya siyasî hebin bijîn û wekî welatiyên wekhev bên naskirin.

Em tenê naxwazin mîrateya pêşiyên xwe biparêzin, em dixwazin wê ber bi paşerojeke dêmokratîk ve bibin. Hêviya me hêza me ye, nasnameya me berpirsiyariya me ye û mafên me yên siyasî jî paşeroja me ne.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## 11 welatiyên din li Rojhilatê Kurdistanê ji aliyê hêzên rêjîmê ve hatine destbiserkirin



Pêka rapora tora Mafên Mirovî ya Kurdistanê, "Sidîq Kerîmî, Mesûd Alanî Kohne Qela, Hadî Ezîzî, Omîd Çawbazî, Emîr Silêmanî, Mihemed Hacîzade, Şiwane Dîwazî, Luqman Qurbanî, Rehman Xozan, Îsmaîl Badsar û Zekerya Badsar", ji aliyê hêzên îtilaat a paşmaweyên rêjîmê li bajarên "Şino, Bokan, Miyandav û Mihabad"ê ser bi parêzgeha Urmiyê, hatine binçavkirin.

Pêka vê raporê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li dema binçavkirina xoserane ya wan welatiyên Kurd de tundûtîjî bi kar anîne û belgeya yasayî bo binçavkirina wan û vekolîna malên wan welatiyan nebûne.

Pêka vê raporê, hêzên hov ên îtlaatê bo binçavkirina "Zekerya Badser", bavê vî "Îsmaîl Badser" wek barimte binçav kiribûn ku heta navbirî xwe bi hêzên îtlaatê da nasandin.

Tevî lipeyketina malbatên wan girtiyan, ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin, cihê ragirtin û tohmetên sepandî bi ser wan welatiyan li ber dest nîne.

## Girtiyekî din ê nerizayetiya befranbara1404 li Kerecê hate darvekirin



Dadgeha rejîma Îslamî ya Îranê roja Yekşemî, 25ê Gelawêjê, darvekirrina "Şehram Sadiqî", yek ji binçavkiriyên xwepêşandanên Befranbara 1404, ragihand.

Mediyaya fermî ya rejîmê îdia kir ku "Sadiqî" di 18ê Befranbarê li Kerecê bi maşînê êrîş kiriye ser hêzên ewlehî û bûye sedema birîndarbûna 7 endamên hêzên rejîmê.

Eva di demekê deye ku heta niha ti zaniyariyek an belgeyek liderheq şêweya dadgehîkirin û pêvajoya yasayî ya dosyaya wî nehatîye belavkirin.

"Volker Turk" Komîserê Bilind yê Mafên Mirovan yê Neteweyên Yekbûyî, heftiya derbasbûyî got ku Tehran cezayê darvekirinê wekî amrazekê ji bo belavkirina tirs û tepeserkirinê di nav civakê de bi kar tîne.

Li gorî amarên Neteweyên Yekbûyî, ji destpêka vê salê ve rejîmê herî kêm 56 kes bi tohmeta ewlehiyê darvekirine ku 27 ji wan pêwendîdar bi xwepêşandanên vê dawiyê bûne. Herwisa zêdetirî 100 hevwelatî jî di bin metirsiya darvekirinê de ne.

## Li destpêka sala 2026 an ve 916 girtî li Îranê de hatine sêdaredanê




Binyada Ebdulrehman Birûmend ku di warê qurbaniyên tundûtûjiya rêjîma Îranê de kar dike, bi weşandina raporokê ragihand ku ji destpêka sala 2026an heta niha, herî kêm 916 kes li Îranê hatine sêdaredan.

Li gorî vê raporê, ji vê hejmarê, 15 cezayên sêdaredanê tenê di nav 12 rojên borî de hatine cîbicîkirin.

Vê raporê herwisa hişyarî daye ku niha hejmareke zor a xwenîşanderên girtî li Îranê bi tohmetên giran û metirsiya micid ya sêdaredanê re rûbirû ne.

Rêxistina Mafên Mirov an ku Îran Human Rights (IHR), ku li Norwêjê ye, di raporokê de ragihandiye ku di heft mehên yekem ên sala 2026an de, sêdaredana herî kêm 444 kesan tomar kiriye ku di nav wan de 12 jin, 17 hemwelatiyên biyanî û 80 kes ji neteweyên xeynî fars, wek Kurd û Belûç û yên dine bûne.

Komîteya Şopandina Rewşa Girtiyan li Îranê jî di rojên borî de bi zêdebûna sêdaredanê yên girtiyên têkildarî xwenîşandanên li welat, navên 60 kesên ku di girtigehên Komara Îslamî de di bin cezayê sêdarêdanê de ne, belav kir.

Vê komîteyê di raporokê de herwisa li ser çarenivîsa nenas a bi dehan dosyeyên din ên bi tohmetên wekî "muharebe", "efsada fîl-erd" û tohmetên din, nîgeraniya xwe anî ziman.

# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (524)

